Rheinbach Stadt

Fachgebiet Soziale Leistungen
Asyl & Integration

An alle Bewohner*innen
der städtischen Gemeinschaftsunterkünfte

29.10.2026

Ji hemû nişteciîhên cihên nişteciihbûna hevpar ên şaredariya Rheinbach re

Daxwaznameya pêkanîna tedbîrên paqijiyê

Nişteciîhên hêja,

Ji demeke dirêj ve, cihên hevpar ên ku ji aliyê hemû nişteciîhan ve tên bikaranîn, wek metbex, tuwalet, hemam û odeyên şuştinê, di rewşeke pir xirab a paqijiyê de tên hiştin. Herwiha, amûr û alavên ku ji bo we hatine peyda kirin jî zirar dibînin.

Ji ber vê yekê, em dixwazin erkên we û encamên qanûnî û aborî yên ku ji ber binpêkirina rêzikan derdikevin, careke din ji we re bibînin.

• Veqetandina çopê û paqijî

Ji bo sedemên tenduristî û paqijiyê, divê hemû çop di konteyner û çopdankên ku ji bo vê yekê hatine diyarkirin de bêne avêtin. Qedexe ye ku çop an tiştên qirêj li kêleka çopdankan û konteyneran bên hiştin.

Hemû nişteciîh mecbûr in ku piştî bikaranîna tuwalet, hemam û metbexan, wan di rewşeke paqij û rêkûpêk de bihêlin.

• Mesrefên zêde

Ji ber ku nişteciîh bi xwe paqijkirinê nakin, Şaredariya Rheinbach neçar dimîne ku ji bo parastina standardên paqijiyê zêdetir ji xizmeta şîrketeke paqijkirinê ya derveyî sûd werbigire.

Ev yek dibe sedema mesrefên zêde, yên ku dê di hesabkirina nû ya xercên nişteciihbûnê de bên hesibandin.

• Hişyariya derbarê cezayên pereyan de

Avêtina neqanûnî ya çopan (wek mînak, hiştina bermayiyên xwarinê an çopê di metbexan de an li kêleka konteynerên çopê), herwiha qirêjkirina cihên nişteciihbûnê, li gorî rêziknameya Şaredariya Rheinbach ya derbarê parastin, bikaranîn û berhevkirina xercên cihên nişteciihbûna

ku bi awayê qanûnî yê giştî hatine peyda kirin (Rêziknameya Nişтecihbûnê û Xercan), wek binpêkirineke îdarî tê hesibandin.

Em balê dikişînin ser vê yekê ku binpêkirinên dubare yên vê rêziknameyê û rêzikên bikaranîna cihan dikarin bibin sedema cezakirina we bi pereyan.

Ji ber vê yekê, ez bi cidiyet ji we dixwazim ku berpirsiyariya xwe ya hevpar bi cih bînin:

Ji kerema xwe cihên nişтecihbûnê paqij bihêlin û bi hev re piştrast bikin ku rêzik tên pêkanîn. Tenê bi vî awayî em dikarin ji bo hemû nişтecîhan cihên nişтecihbûnê yên paqij û tendurist peyda bikin.

Ger pirsên we hebin, ji kerema xwe bi van kesan re têkilî daynin:

Birêz Burak Gül (Tel. 02226-917354)

Birêz Dirk Hergarten (Tel. 02226-917121)

Ji bo têgihiştin û hevkariya we spas dikir.